di Konferansa li ser Şêx Fexrê Adiyan û di pîrozbahiya 15 emîn salvegera damezirandina Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldênbûrgê de, nesaxî û xembariya dilê min nehîşt ez biaxivim.

Xuşk û birayên di komîta birêvabira Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldenburg ê de ne,

hûn jî dizanin ku ez gelek caran dibêjim, gava em rastiya pêdivî û peywendiyên netew-civaka xwe nas bikin û li xwe mikur bên, em dikarin baştir çande û zimanê Kurdî(Êzdiyatiyê) biparêzin, civaka xwe gav bi gav biguhêrin û xwe bi pêş ve jî bibin.

Raste, min di destpêka meha nîsana vê sala 2008 de bihîst ku we endamên komîta birêvabira Mala Êzîdiyan Oldenburg` ê bîryar daye û dixwazen di navbera 31 a Çiriya pêşîn û 2 yê Çiriya paşîn de pîrozbahiya 15`emîn salvegera damezirandina ***Komela Çande û Dînê Êzîdiyan*** *pîroz bikin û di nav van rojan de jî konferansekî zanistî û lêkolînî li ser qewl, dua û beytên me yên pîroz û bi taybetî jî li ser zaniyar, filosofî û wêjeya Şêx Fexrê Adiyan derbas bikin.*

Vêca, weke ku hûn jî dizanin, min ji ber gelek sedeman nikaribû di herdû rojên çalekiyên pêşîn de amade bivim. Ji xwe we jî dît, gava ez di roja sisiyan de hatim û min di dawiya her kesî de mafê axaftinê girt jî, ez gelekî bi xembar bûm. Mêvan û beşdarên civînê jî dîtin ku min ji ber wextê kin û bilindaya lêxistina dilê xwe yê ne sax jî nikarîbû gilî û gazinên dilê xwe de ji we, axaftvanên semîneran, beşdar û mêvanên birêz re bînime ser ziman.

Ji ber wê jî, ez dixwazim niha hinek ji wan gilî û gazinên xwe dîsa jî ji we û axevtvanên semîneran yên rêzdar ra bi niviskî bibêjim:

Hêjayan!

Bi dîtina min, hûn endamên komîta birêvabira Mala Êzîdiyan Oldenburg`ê di pêkanîna çalekiyên xwe yên ku di navbera 31 a Çiriya pêşîn û 2 yê Çiriya paşîn de ji bo Konferansa li ser zaniyar, filosofî û wêjeya Şêx Fexrê Adiyan û pîrozbahiya ji bo 15`emîn salvegera damezirandina Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldênbûrgê çêkirin de ne gehîştine gelek armancên xwe û sedema vê yekê jî ew e ku we gelek giringî nedane emeka zahmetkêş, xizmetkar û endamên Mala xwe.

Ne şixwe, wekî ku we pîrozbahiya 15`emîn salvegera damezirandina Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldênbûrgê çêdikir, pêwîst bû ku we di nirxandinên xwe de ev xal û babetan ji bo beşdar û mêvanan êşkere bikrina:

Yanî we ji me re zelal bikirina:

ka **Komela Çande û Dînê Êzîdiyan** bi fikir, berxwedan û serîhildanên kîjan endaman hatiye damezirandin,

kî ji nûner, xebatkar û endaman singa xwe deye ber gelek zor û zextên hatine serê rêvebir û avakirên Mal-Komelê,

kîjan endaman ji bo parastin û pêşvebirina ziman-ola kurdî û li dijî asîmîlasyonê tekoşîn dane,

kî ji wan bi mal-pere û keda xwe tevî qampaniya avakirina xaniyê Malê bûne û ji ber çê birêvebirên Malê hêjî nikarin deynên van endaman li wan vegerînin,

kî ji endaman gemar, bermayî û feraxên ne endamên Malê paqij kir, dike û hêjî stûnên vê Malê ne,

gelo we kîjan qîz, law, dê, bav, oldar, heval û dostên Mal-komelê hêjayî xelata parastin û pêşvebirina urf-adet, rê-resim, qewl- dua-beytên pîroz yên babçekên Êzdiyan(yên mîna *Şêx Fexrê Adiyan û hwd.*) çande û zimanê kurdî dîtin,

ji ber çê gelek ji van qîz, xort, jin, mêrên Êzdî(binêren li wêne..) û dostên Êzdayetiyê ji Malê dûr ketine, dikevin û hezkirina wan ji Malê re çênab e

DENGÊ ÊZÎDİYA

ROJNAMA ÊZÎDİYA, JI BONA PARASTINA ÇANDÊ Û DÎNÊ ÊZÎDÎ

Mai 1994 * Ausgabe Nr.3 * deutsch, kurdisch und türkisch * Preis DM 2,00
Gulan Sal 2606 * Hejmar 3 * Almanî, Kurdî û Tirkî * Biha 2,00 DM

Jugendliche - Hoffnungsträger unserer Religion

Die Zukunft unserer Religion ist in entscheidenem Maße davon abhängig, inwieweit sich unsere Jugendlichen mit dem Yezidentum identifizieren können. Sie sind die zukünftigen Säulen der yezidschen Gesellschaft und ihre Überzeugung allein entscheidet über das Fortbestehen unser Religion. Deswegen sollte unser Blick besonders auf die Interessen, Wünschen und Probleme der Jugendlichen in Bezug auf das Yezidentum gerichtet sein. Wie sieht nun ihre Situation in Deutschland aus?

Wenn man einen Jugendlichen nach dem Yezidentum befragt, so muß man die Erfahrung machen, daß er über die Bräuche und Sitten der Religion wenig informiert ist. Dies liegt nicht daran, daß der Jugendliche kein Interesse an dieser Religion hat. Er nimmt durchaus am gesellschaftlichen Leben teil, besucht Hochzeiten, lernt Tänze, spricht die kurdische Sprache, etc...

Der eigentliche Grund für diese Unwissenheit ist der, daß in der Gesellschaft und insbesondere in diese Vorteile genießen können, müssen sich zuerst die Kenntnisse der Jugendlichen über die eigene Kultur verbessern. Wenn wir wollen, daß das Yezidentum von den Jugendlichen weiter aufrechterhalten wird, dann brauchen wir ein yezidisches Bewußtsein. Es

Yezidische Jugendliche

Dengê Êzidîya * Gulan 2606 * Kurdî * Rûpel 12

Civîna Ciwanin Êzîdiya li Oldenburg'ê

Civîna Ciwanin Êzîdiya ya yekemîn de Keç û Xortan ji Dînê Êzîdîre gotin erê!

Oldenburg. Li Oldenburg roja 13 Adarê 1994'a cara yekemîn keç û xortin Êzîdiya civiyan. Komela Çande û Dînê Êzîdiya ya Oldenburg'ê bangî hemû Keç û Xorten Êzîdiyê li Oldenburg'ê kiribû. Armanca civînê ewbu ku Ciwan li ser pirsa Kultur, Dîn û rewsa xwe xeberdin, bi hevû dinre bişêwirin. 53 Keç û Xortin Êmrê wan di navbera 15-20 salande bêşdarî civînê bibun. Civîn li Kulturzentrum Rennplatz Oldenburg'ê

Komita serkarî pêşniyar anî got ku: "Em karir Semînera li ser Dîrok û rêza dînê Êzîdiya pêkbînin" Ciwanan ev pêşniyarî zaf maqûl dîtin û gelekî kêfxwe bun. Ji xeynî van gotinan pêşniyarên dirûst jî hebun. "Em zaf baş di bînin ku Komela Çande û Dînê Êzîdiy hatiye avakirin. Em dixwazin ciyekî kufş bikin ku em karibin temî li bicivin û gelek xebatan bihevre bikin" Gelek Ciwanan di axaftinen xwede alaoederiva xwe l

û

we da xwanê ka çima piraniya endamên Malê di van çalekî û pîrozbahiya 15`emîn salvegera damezirandina Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldênbûrgê de amade nebûn e?

Di der heqê Konferansa li ser zaniyar, filosofî û wêjeya Şêx Fexrê Adiyan de jî min dixwast van agehdariyan bigrim anjî van guman û pirsên xwe bibêjim:

Dilê min dixwast bizanibim ka,

1 *tu kes dizane gelo Şêx Fexrê Adiyan zaniyar, filosofî û wêjeya ya kurdî jî kîjan ilimdaran girtiye ?*

2 *Çi pêwendiyên Şerefedînê ji binemala* ***Şêx Fexir-kurê Êzdîne Mîr*** *û* ***Şerefedînê kurê Şêx Hesen*** *bihevûdinê re hene ?*

3 *Di nava rê û resmên Êzdiyatiyê de çi rolên* ***Şerefedînê Şêx Fexir****(kurê Êzdîne Mîr) hene ?*

4 *Ka cudatiya di nava* ***Şêx Fexirê Adiyan û Melik Fexredîn*** *de çi ye?*

5 *Gelo cudatiya di nava* ***Melik Fexredîn û Melik Şêx Sin*** *de çi ye?*

6 *Çend berhemên Şêx Fexrê Adiyan hebûn,*
heta vêga çend ji wan hatine weşandin ,
çima ew zaniyar, filosofî û wêjeya wî di nav kurdan de baş nehatiye nas kirin,
ji ber çê hinek dîrok zane û wêjevanên Kurd nikarin anjî naxwazin berhemên wî di nav gelê Kurd de bêne nas kirin?

Her weha hêvîdarim her kes bizani be, baweriya me Êzdiyan ya bi Xwe(Ez)da nasînê, reseniya ilm, batinî û ola xas-babçekên me Êzdiyan(çi yên berî û piştî Şêx Fexrê Adiyan hatine) ku hîmdarên ruhê Kurdewariyê ne wê her berdewam bive.

Ez bawerim gelek ji mêvan û guhdaran jî bihîstên û dîtin ku wan çend gotinên di rexnên min de hûn mecbur kirin ku hûn di dawiya civînê de navên çend zahmetkêş û amedekarên Konferansê bînine ser ziman.

Bê guman, gava ez bersiva van nêrîn, daxwazî û pirsên xwe ji we bi niviskî anjî di nava wan gotar û mijarên Konferansê yên ku hûn dixwazin mîna pirtûkekê bi weşînin de jî bivînim, ezê zêdetir dil xweş bivim.

Bila Xwedê û hemû xasên Êzdiyan alîkarên me bin!

Silav û hurmet

Birayê we Kemal Tolan
Endamekî damezirê Komela Çande û Dînê Êzîdiyan û redaktiona Dengê Êzîdiya ya Kevn e.

09.11.08